



Zimanê zaroka ser 6 mehî re

Hin agahiyên derbarê zimanê zaroka ser 6 mehî re

- Zarok dixwazin dinyayê keşf bikin! Bala te lê be bê zaroka te li çî dinere û navê wî tiştî bêje. Xweşiyên hûr û gir bi hev re peyda bikin!
- Ji niha de zaroka te bi îfadeyên ruyê xwe, bi deng û tevgerên xwe bi te re diaxive. Di nêzîk de zaroka te wê dest bi xilde-bildê jî bike û dengên wekî *da-da* û *ta-ta* bêje.
- Zaroka te di nêzîk de wê peyvên wekî *dadê*, *babo* û *were* jî fêm bike.
- Kêfa zarokê tê bi te re biaxive, çavçînk û lîstikên bi heraket bilîze. Lîstikên wekî *yek dido bawer sisê*, *şenga min* û *penga min*.

Qala her tiştî bike

Ji zaroka xwe re behsa her qewmîna ku ew baldariyê nîşan dide bike. Li ser xwarinê, kincan, tiştên hûn dibînin û dikin biaxive. Guhdarek baş be, da zarok bixwazibe biaxive. Bi sebir be!

Biguhere û dubare bike

Dengê zarokê dubare bike, texmîn bike bê dixwaze çî bêje û binav bike. Bimîne heta ku zarok bideng an jî îşaretan bersivê dide û paşê bidomîne. Ji niha de zarok fêr dibe ku mirov bi dorê diaxive û fêr dike ku girêdanek di navbera peyv û alavan de heye.

Lîstikên zimanî bilîze

Stranan bêje, gotinan li hev bîne, lîstikên zimanî bilîze. Tilîk û pêçiyên xwe bi kar bîne, dengên vîzevîz û vingîniyê derîne, henekan bike! Ji kitêbxaneyê tu dikarî kitêb, stran û mûzîka li gor zaroka xwe deyn bikî.

Bi hev re bixwînin û biaxivin

Wextê zarok fêr bû awir û îşaretên te bişopîne êdî baş e tu kitêbên îşaretê (pekbok) nîşan bidî. Wêneyan nîşan bide û behs bike. Guh bide zarokê bê bala xwe dide çî. Di destpêkê de baldarî demkurt e, lê gav bi gav êdî fêr dibe giraniyê bide ser tişteki.


Bi zimanê xwe yê dayikê biaxive

Bi zimanê xwe yê dayikê biaxive, bistirîne û bixwîne. Pîraniya zarokên li dinyayê di civatên pîrzimanî de dijîn, û mezinbûna bi gelek zimanan gelek feydeyan bi xwe re tîne.

Agahiyên berfirehtir

- Ji malbera Bokstart tu dikarî bixwînî: www.bokstart.se
- Eger tu ji ber zimanê zaroka xwe bifikarî serî li barnavårdscentralen (navenda lênerîna zarokan) bide. Derbarê zimanê zaroka xwe de tu dikarî bi karmendên pêşdibistanê re jî biaxivî.

Hikûmetê erka pêşxistina xwendin û handana zimanê zarokan daye Kulturet (Konseya çandê). Bokstart hewldaneke neteweyî ye da alîkariya dêûbavan û salmezinan bike.



Zimanê zaroka ser 1 salî re

Hin agahiyên derbarê zaroka te ya ser 1 salî re

- Zarok bi îşaret û denga dixwaze tiştêkî ji te re bêje.
- Peyvên pêşî li ser vê derê û niha ne, wekî *gok*, *bûk* û *mey*.
- Zaroka te ji peyvên ku dibêje bêhtir fam dike, lê ji bo wergerandin û şîrovekirinê divê tu alîkar bî.

Baldariyên zarokê bişopîne

Her tiştê hûn dibînin û dikin tu dikarî ji bo pêşxistina zimanê zarokê bikar bînî. Nav li wêya ku niha bala zarokê dikişîne bike! Gava zarok tiliya xwe bi pisîkê ve dike û dibêje *ew*, tu dikarî bêjî: *Erê, ew pisîk e. Tu ji pisîkê hez dikî?* Û li benda besiva zarokê bimîne.

Dên û bala xwe bide û guhdar be

Wextê tu dên û bala xwe bidî zarokê û baş guhdar bî, zarok wê hîs bike ku peyama wê girîng e. Yan zarok dixwaze gotinekê bêje, nîşan dide yan jî dixwaze tiştêkî bêje te. Li gor bersiva te zarok fêr dibe ku mirov bi dorê diaxive.

Lîstikên zimanî bilîze

Stranan bêje, gotinan li hev bîne, lîstikên zimanî bilîze. Tilîk û pêçiyên xwe bi kar bîne, dengên vîzevîz û vingîniyê derîne, henekan bike!

Bibîne û behs bike

Behs bike bê bûka zarokê çî dike yan jî bê otobus ber bi ku ve diçe. Li ser wêneyên nas û dostan biaxive. Divê zarok heman peyvê, gelek caran, di rewşên cuda de bibihîze.

Kitêbên hêsan ên bi wêne bixwîne.

Niha hûn dikarin kitêbên bi wêne bikar bînin. Pêşî li wêneyan binerin û tev de îşaret bikin. Di destpêkê de hêsantir e tu serbest behsa wêneyan bikî. Paşê tu dikarî nivîsê bixwînî û zarok guhdarî bike. Kitêbxane dikare pêşniyaza kitêbên li gor temenê zaroka te bike.

Bi zimanê xwe yê dayikê biaxive

Bi zimanê xwe yê dayikê biaxive, bistirîne û bixwîne. Pîraniya zarokên li dinyayê di civatên pîrzimanî de dijîn, û mezinbûna bi gelek zimanan gelek feydeyan bi xwe re tîne.

Agahiyên berfirehtir

- Ji malbera Bokstart tu dikarî bixwînî: www.bokstart.se
- Eger tu ji ber zimanê zaroka xwe bifekarî serî li barnavårdcentralen (navenda lênerîna zarokan) bide. Derbarê zimanê zaroka xwe de tu dikarî bi karmendên pêşdibistanê re jî biaxivî.

Hikûmetê erka pêşxistina xwendin û handana zimanê zarokan daye Kulturetverket (Konsleya çandê). Bokstart hewldaneke neteweyî ye da alîkariya dêûbavan û salmezinan bike.



Zimanê zaroka ser 18 mehî re

Hin agahiyên derbarê zaroka te ya ser 18 mehî re

- Gelek zarokên di vî temenî de derdorê 200 peyvên rojane fêhm dikin.
- Hin peyvên zarok bi xwe bikar tîne, lê ev peyv di rewşên cuda de dikarin bi wateyên cuda bin.
- Hin zarok dikarin peyvên peve bikin, wekî *mama erebe yan jî pisîk waye*.

Bi hev re gelekî biaxivin

Behs bikin bê hûn di rewşên cuda de çi dikin. Ji zarokê re bêje bê çi diqewime û tiştên hûn dikin binav bike. Guhdar bike bê zarok dibê çi û çi difikire. Ji zaroka xwe re bi sebir be.

Gotinên zarokê erê bike û pêş bêxe

Gava tu peyvên zarokê bikar tînî û peyvên nû tevî dikî, tu dibî alîkar da zimanê zarokê pêş bikeve. Eger zarok bêje *"am am"*, tu dikarî bêji: *Erê, ev xwarin e û em ê niha xwarinê bixwin*. Pir normal e ku zaroka te di vî temenî de di şûna *"pisîk"* de bêje *"sîk"*. Zarokê serast neke, lê tu bi xwe peyva pisîk bi kar bîne da zarok bibihîze bê mirov çawa dibêje.

Pêwandiya bi cîhana zarokê ve bibîne

Eger tu tiştêkî nû bi cîhana zarokê ve girê bidî ku ew bi xwe nas bike zûtir fêr dibe. Wek mînak eger hûn wêneyê şalekî bibînin tu dikarî tiliya xwe bi şalê zarokê ve bikî û bêji: *Şalê te jî heye, tam wekî zaroka di kitêbê de*.

Pev re biaxivin û bixwînin

Niha kêfa zarokê tê ku hûn li kitêbên cuda binêrin û ser biaxivin. Pirsên li ser bûyerên di kitêbê de bike û bi tecrûbeyên zarokê ve girê bide: *Tu çi difikirî...? Tê bîra te...?*

Bi zimanê xwe yê dayikê biaxive


Bi zimanê xwe yê dayikê biaxive, bistirîne û bixwîne. Piraniya zarokên li dinyayê di civatên pîrzimanî de dijîn, û mezinbûna bi gelek zimanan gelek feydeyan bi xwe re tîne.

Agahiyên berfirehtir

- Ji malbera Bokstart tu dikarî bixwînin: www.bokstart.se
- Eger tu jî ber zimanê zaroka xwe bifikarî serî li barnavårdscentralen (navenda lênerîna zarokan) bide. Derbarê zimanê zaroka xwe de tu dikarî bi karmendên pêş-dibistanê re jî biaxivî.

Hikûmetê erka pêşxistina xwendin û handana zimanê zarokan daye Kulturetverket (Konselya çandê). Bokstart hewl daneke neteweyî ye da alîkariya dêûbavan û salmezanan bike.

Bokstart



Zimanê zaroka ser 3 salî re

Hin agahiyên derbarê zaroka te ya ser 3 salî re

- Gelek zarok niha bi sedan peyvan fêm dikin. Ew peyvan dikine hevok û dikarin axavtinên kurt bikin.
- Zarok gelek pirsan dike û êdî fam dike bê mirov çawa dikare peyvan bikar bîne û dikare bi wan bilîze.
- Zaroka te dikare behsa serpêhatiyên xwe bike û hez dike guhdariya axavtina te bike.

Tîp û peyvan keşf bikin

Di temenê pêşdibistanê de gelek zarok tîp û peyvan meraq dikin. Nivîsên ser şilt û pakêtan îşaret bike û bixwîne. Bi hev re li nîşan û sembolên dora xwe binerin, li ser biaxivin û behs bike bê wateya wan çi ye.

Peyvên nû îzah bike

Ji bo bûyeran û tiştên hûn rojane dibînin peyvên nû bikar bîne. Peyvên ku zarok fêm nake îzah bike: *derya wekî golê ye, lê pîr meztir e. Yan jî: Gava em diçine peravê, em dikevîne deryayê de.*

Biaxive

Qala bûyerên rojê bike. Behsa tiştêkî zarokê li pêşdibistanê kirî bike da ku zarok bi xwe li ser biaxive.

Piraniya zarokên sê salî peyvan weke salmezînan nabêjin. Gava te gotinek cuda bihîst tu dikarî rastiya wê bêjî da ku zarok hînî awayê rast bibe.

Pev re bixwînin

Bike adet ku her roj hûn kêliyêkê tev de bixwînin. Gelek zarok kitêbeke wan a favorî çêdibe ku dixwazin tim ew were xwendin. Nivîsa kitêbên wêneyî niha dikare bêhtir be, lê dîsa jî mirov hem diaxive hem dixwîne.

Rê ji axavtinê re veke, bê kitêb behsa çi dike û zarokê han bide da pirsan bike. Wextê zarok pirsan dike, raweste, guhdarî bike û bi hev re bifikirin.

Bila li bîra te be ku zarok bi lîstikê fêr dibe. Lewra bilîze, bixwîne, bistirîne û pev re civatê bigirin. Hê jî zarok ji stran, lihevanîn û stranên zarokan hez dike. Herî baş mirov bi xwendina kitêban fêrî peyvên nû dibe.

Bi zimanê xwe yê dayikê biaxive

Bi zimanê xwe yê dayikê biaxive, bistirîne û bixwîne. Piraniya zarokên li dinyayê di civatên pîrzimanî de dijîn, û mezinbûna bi gelek zimanan gelek feydeyan bi xwe re tîne.

Agahiyên berfirehtir

- Ji malbera Bokstart tu dikarî bixwînî: www.bokstart.se
- Eger tu ji ber zimanê zaroka xwe bifikarî serî li barnavårdscentralen (navenda lênerîna zarokan) bide. Derbarê zimanê zaroka xwe de tu dikarî bi karmendên pêşdibistanê re jî biaxivî.

Hikûmetê erka pêşxistina xwendin û handana zimanê zarokan daye Kulturet (Konsëya çandê). Bokstart hewldaneke neteweyî ye da alîkariya dêûbavan û salmezînan bike.

Bokstart